

Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

Mihemed Fehîm ê Mele Hesên

Koça dawîn bar kir

Roja Duşembê 30.03.2009Z, li gundê **Cimayê**, dilê hevalê me yê hêja **Mihemed Fehîm** (Bavê Azad)

rawestiya. Piştî nîvro, bi beşdarbûna cemawerekî mezin û gelek heval, dost, komên folklorî, nûnerên partiyên

Kurdî û xelkên gundê

wî "**Cimayê**", termê wî li mezêlê gundê **Xizna** ku derdora 20km bareşî bajarê **Qamişlê** ye hate veşartin. Hevalê **M.Fehîm**, mirovekî Kurdhez û di malbateke welatparêz de mezin bûye, ji biçûkaniya xwe ve, barê kurdîtiyê hilgirtiye ser milên xwe û kar û xebat di ber doza gelê xwe ya dadmend de kiriye. Raste ku ta roja dawî ji temenê xwe ew hevalê partiya me bû jî, lê di naverok û rastiya xwe de, ew hevalê hemî hêz û partiyên Kurdî li Sûriyê bû, ji daxwazkerên yekîtiya tevgera netewiya kurdî bû, ji hezkerên tevgera netewiya niştimanî bû û herdem daxwaza pêşvebirina têkiliyên dostane bi hêzên Erebi û Asorî re dikr. Hevalê **M.Fehîm**, di xortaniya xwe de, di ciwaniya xwe de, di rojên ku karê Kurdayetiyê bi tirs û saw bû, ji bo dermankirina derd, kul û êşên gelê xwe, ji bo wekhevî û azadiyê xebateke bê westan kiriye, ji ber wilo jî, ew li nik gelê xwe cihê rêzgirtineke balkêş bû.

Bila serê malbat, heval, hogir , kes û kurên wî sax be û cihê wî buhuşt be.



Xelata O . Sebrî ya siyem

Di sala 1998 an de, çend rewşenbîr, nivîsevan, helbestvan, û rojnamevan, bi boneya 93 saliya ji dayîkbûna Apo Osman Sebrî li Şamê civiyan. Li dawiya civînê pêşniyarek hate holê, ku xelatek bi navê wî bête damezrandin, ji bo kesên biyanî, ku xebatên hêja ji bo gelê kurd kirine, were pêşkêşkirin.

Di sala 2000î de cara yekê bû ku,

" Komîta Xelata O. Sebrî "

bervedêrê doza gelê Kurd, civaknas û nivîskarê Tirk, por. Îsmâil Bîşekcî

xelat dike. Û di sala 2004 an de, dayîka Kurdan, xanima rêzdar Danyêl Mîtîran hate xelatkirin.

Îsal 2009 an jî, cara siyem ku, dostê gelê Kurd rêzdar Dr. **Munzir El-Fedil**, di 04-04 2009 an de, li Stockholmê tê xelatkirin. Daxuyaniya komîtê, ya ku , di 28. 09. 2008 de hatibû weşandin, wî weha dide nasîn : "**Dr. Munzir El-Fedil kesayetiyeke Erebe û ji Îraqê ye, li bajarê Necefê ji dayik bûye . Weke tete zanîn jî, bajarê Necefê bi gelek nivîskar, helbestvan û siyasetmedarên xwe navdar e. Şêxê helbestvanên Erebe Muhemed Mihdî El-Cewahirî jî ji bajarê Necefê bû, ewî dastaneke helbestî pir nirxbuha ji zû de terxandibû Kurdistanê, gelê Kurd û serokê nemir Mile Mistefa Barzanî. Neweyên Kurd, ku bi zimanê erebî dizanin, herdem wê dastanê dixwînin û xwe pê şanaz dibînin"**

